Rapora MİT ê ya Kerkûkê

Gabar Ciyan

Di dema şerê Îsraîl û ereban de, xurtbûna Îsraîlê pişta xwe dida zîrektiya dezgeha îstixbaratê. Hayê wan ji çalakiyên ereban çê dibû, û di zûtirin demê de rê li ber wan digirtin. Ji bilî wê, bi êrîşen pir alî û plankirî tevayê daxwaziyên wan têk dibirin.

Rojekê, birêvebirên ereban biryar didin ku civînekî bi dizî li Misrê pêk bînin. Berpirsiyarên ereban, roja civînê li cihekî dicivin û dest bi niqaşê dikin. Mîna herdem gotûbêjên wan dirêj dibin. Hêj civîn bi dawî nehatî, Radyoya Dengê Îsraîlê qala civîna wan kir.

Nirxandina polîtîka Îsraîlê ne karê min e. Lê ez qala hêz û giringiya îstixbaratê dikim. Ez dixwazim bi serpêhatiya cihû û ereban bala xwendevanan bikşînim ser cî û rola xebatên îstixbaratê. Bi baweriya min, îro jî cihû ji awira îstixbaratê zîrek in. Di welatê xwe de têra xwe demokrat in, ji bo hevwelatiyan rêya rexne û rexnegirtinê vekiriye. Ew, têkiliyên xurt bi dost û dijminan ra datînin. Lê têkilîyên baş anjî neyênî, nikare rê li ber îstixbarata wan bigire. Ji ber ku îstixbarat tedbîr e, rêgirê çalakiyên neyênî ye. Hizûr û kêfxweşiya hevwelatiyan bi saya dezgeha îstixbaratê dikare pir baştir bibe. Berjewendiyên netewî, cihê xwe, bi hebûna îstixbaratek e xurt, tekûztir dike. Îstixbarat, zaniyariya rojê ye, ya adinî rojê ye, ya pêşerojê ye. Bêyî wê, xebatên wezareta parastin û ewlekariyê, ya navxweyî, ya derve nikare baş kar bike.

Dema referandûma Kerkûkê nêz dibe û Hikûmeta Herêmê jî xebatên xwe li ser qanûnên nû xurtir dike. Beşek ji wan qanûnan li ser netewîkirina Petrolê û pirsa Kerkûkê ye. Pirs, giring e û ji awira îstixbaratê ve balkêş e. Dezgeha Netewî ya Îstixbata Tirkiyê-MİT jî li herêmê bi dizî kar dike û zaniyariyên di derheqa qanûnên nû, hêza leşkerî ya Kurdistanê, armanca serokên kurda, bi hêzbûn û qelsbûna kurda bi dest dixîne. Ez dixwazim çend malikan ji rapora MİT ê ya nû ku li ser pirsa Kerkûkê amade kiriye

tê raçavkirin. Pir bi sûd e ku Tirkiyê ji awira berjewendiyên xwe tedbîran bigire.``

Rapor bi firehî qanûnên ku Hikûmeta Herêmê li ser kar dike, dinirxîne û diyar dike ku cihên petrolê di bin du navan de hatine analîzkirin."Cîhên di dest herêmê de" û "Cihên pêşerojê". Cihên di dest de, ew cîhin ku ji tebaxa 2005 ê û vir ve dixebitin û rojê 20 hezar warîl petrol ji wan tê bidetsxistin. Deverên li derveyî vê bendê dimînin, dikevin nav rêza pêşerojê. Aliyên ku dikevin ber qanûna petrolê, bêhtir Herêma Kurdistanê ye. Lê ji bilî wê, "Cihên hinekî bi ixtilaf" jî hene. Kerkûk jî di nav cihên ixtilaf de ye û ew jî ji cihên pêşerojê tê hesêp. Li ser vê bingehê, gava mirov berî referandûmê bawerî pê bîne (bi hilbijartinek erenî bawer bike) ku Kerkûk dê bi herêmê ve bê girêdan, bêyî çêbûna referandûmê Kerkûk dê bibe cihek ji yê pêşerojê. Hikûmeta Herêmê bi vê gavê li ser petrola wir dê bibe xwedî gotin, li ser nefta Kerkûkê û ya heremê dibe xwedî maf ku pêşkêş bikim. Rapor di hefteya derbasbûyî de ji aliyê "Zarathustra News" hatibû bi dest xistin.

Rapora bi dizî ya Kerkûkê, ji aliyê şêwirdarê MİT ê Cemal Uzgören ve hatiye amadekirin. Paşê ji dezgehên dewletê re hatiye şandin. Di destpêka raporê de wisan tê gotin: "Statûya Kerkûkê di gel rol û nefta wê, ji aliyê Tirkiyê ve bi baldarî tê raçavkirin. Li ser vê bingehê, MİT, xebatên giring yê îstixbaratê li wir pêk tîne, li ser xeterên pêşerojê dezgehên Tirkiyê şiyar dike". Wisan didome rapor: "Hikûmeta Herêmê qanûnên Petrolê ji bo herêma kurda amade dike. Bi vê jî xuyanî dike ku Hikûmeta Herêmê dixwaze Hikûmeta Navendî ya Îraqê ji dewrê derxîne û mîna dewletek serbixwe bilive. Pêşketinên li wir ji aliyê me ve, bi şêweyek peljenî

peymanan bi welatên 3 ê re îmze bike. Hikûmeta Herêmê li ser xeta boriyên neftê jî dê bibe xwedî biryar. Dikarin bê îcazeya Hikûmeta Navendî, mîna welatek serbixwe xebatê bikin...

Weke ku tê xuyanî kirin, MİT hayê xwe pir alî ji naveroka qanûnan heye. Li ser biryar û dîtinên Hikûmeta Herêmê têr înformasyon e. Xebatên Hikûmetê pir alî raçav dike. Ji bo ku rê li ber xebatên Hikûmeta Herêmê bigire bi dezgehên Tirkiyê re kar dike. Di raporê de qala hêzên biçek yê Kurdistanê dike. Li ser biryara serokatiya Mesûd Barzanî ya Kurdistanê û armanca li dû vê biryarê dikole. Zaniyariyên aborî bi dest xistine. Bi vê raporê diyar dibe ku MİT li Herêma Kurdistanê bi hêsanî kar dike, zaniyariyên cewaz bi dest dixîne.
Ez serkevtina Hikûmeta Herêmê ji dilê xwe dixwazim. Ez piştgiriya têkiliyên dostanî bi welatên cîhanê û cînaran re dikim. Girêdanên dostanî û aborî pir giring in. Lê pêwîste pirsa têkiliyê bi ya ewlekariyê ve neyê girêdan. Divê ez vekirî bêjim ku rapora MİT ê kêmasî û qelsiya Hikûmeta Herêmê ji awira ewlekariyê ve derdixîne holê. Pêwîst e Kurdistan nebe cî û meydan ji bo îstixbarata neyênî. Pêwîst e rê li ber xebatên wisan bi zûtirîn demê bê girtin.
Ez bi xwe jî zanim ku çareserî ne hêsan e. Îro li başûrê Kurdistanê 1200 şîrketên Tirkiyê hene. 15 hezar karkerên wan li wir dixebitin. Ew, bi beşek ji nijadperestên turkmenên Îraqê re jî dixebitin. Çalakiyên wan yên îstixbaratê pir alî hene. Ne tenê Tirkiye, welatên cînar tev hewil didin ku li ser wê xaka pîroz xebatên gemar bikin, dikin.
Di rewşek wisan de mafê Hikûmeta Herêmê heye ku:
- Qanûnên ewlekariyê xurtir bike û li dijî xebatên îstixbaratên neyênî gavên manîkêr û modern bavêje.
- Li hemberî ``sîxûrî û îstixbarata aborî, ewlekarî û leşkeriyê`` xwe ji nû ve organîze bike.

- Pêwîst e dezgehek nû ku tenê ji aliyê pisporên aborî, îstixbarat, ewlekarî, leşkeriyê ve bê îdarekirin ava bibe.

- Ji bo parastina birêvebir û kirina operasyonên taybet, perwerdekirina komek polîsên elît jî pêwîst e.

Pirs, hasas e. Giring e. Gavên modern pêwsît e. Dema gav neyên avêtin çi cewaziya me ji erebên di civîne de namîne...